



## Piştgirî û Hevcoî

Serdana me pîngava yekime bo peyda kirina şolê yan kursên perwerdehîyê nû. Çavdêr û rabêjkarê peyda kirina şolê tê di rêya peyda kirina şolê da gel we hevrê bîr û piştgirîya we bike. Armanca me eve ku em di derfeta yekim da şol yan kursa perwerdehîya kêrhatî li gor rewşa we, ji were peyda bikin.

### Hûn amadene bo peyda kirina şolek nû?

Emê ser esasa derfetên şolên kêrhatî ligel profîla we, alîkarîya we bikin. Tora me di pîşesazîyan, pêşengehan û xalên cûda da bilave û tê ev navendene berdestê we bin. Şol tê bi şeweyekê bêne pîlan kirin ku du derfeta herî nêz da hûn şoleke kêrhatî peyda bikin. Rabêjkarên me yê şolê rojane ligel xwedîkaran pêwendîyê digirin û tora me roj bi roj mezintir dibe. Em berdewam agadarî pêwîstîyên kompanîyaya li hêla merovî da dibin û bilez profîla we gelê cot dikin.

### Hûn dixwazin şola xwe biguherrînin yan hêsta nizanin ka di çi mijarekê da bixebitin?

Çavdêrê piştîvan di rêya tîketina nava bazara şolê û peydakirina şolê yan kursên perwerdehîyê tê li kêlega we be. Eger kursa perwerdehîya li gor rewşa we peyda bibe, rabêjkarê Perwerdehî û Peydakirina şolê şeweyên peyda kirina kursên perwerdehîyê cûda radestî we dike daku bikarin bilez beşdarî ev kursane bibin.

### Bi wî awayî hûn pêngava yekim diavêjin

Bo bidestanîna agahîyên bêtir liser bernameya ' Piştgirî û hevcoî "gel çavdêrê xwe di Xizmeta Peyda kirina şolê yan gel me bi navnîşana elektronîkî [nyttjobb@workforyou.se](mailto:nyttjobb@workforyou.se) pêwendîyê bigirin daku şîreta radestî we bike. Di nava emaila xwe da bajarê dilxwa bo şolê qeyd bikin daku yek ji endamên me ku nêzî şûna we ye bilez gel we pêwendîyê bigire. Xatirê we!

**Agahîyên liser me:** Work for You zêdetir ji deh salane ku di mijara peyda kirina şolê da dixebite. Em nêzî 300 çavdêr û rabêjkarên ku bi tevahî bazara şolê û danûstandinê nas dikin û tecrûbeyê mezin di mijara peyda kirina şolê da hene, bikar dînin. Taybetmendîya hevbeşa me hemûyan dilsojîya bo xelkê û bawer kirina şarezayîyên xelkê ye. Gelo hûn bi zimanekî diaxivin? Gelek ji endamên me çend zimana dizanin û me tecrûbeyê mezin di mijara piştgirîya zimana da hene. Agahîyên bêtir di at [www.workforyou.se](http://www.workforyou.se) da bixwînin.